Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1144 | 18-Sibat- 2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | ☎ 423165


# Ji Koma Rocyar klîba 'Apo roja welatê min e'



Koma Rocyar bi zaravayê Hewramî stran û klîbek bi navê 'Apo roja welatê min e' amade kir.
Koma Rocyar a ser bi Navenda Çand û Hunerê ya Bêstûn a Rojhilatê Kurdistanê, di salvegera 25'an a komploya navneteweyî ya 15'ê Sibatê de stran û klîbek ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan amade kir.
Klîba bi navê 'Apo roja welatê min e' bi zaravayê Hewramî hatiye amadekirin.
Naveroka stranê bi vî rengî ye:
"Apo roja welat e, gulesosina welat e
Wî bejn fena şilêr e, wî gotin ava heyat e
Apo rêberê me ye, kêşaye rêya azad e
Kêşaye navê Kurd ji nav toz e
Apo dibêje gel rizgar be, bila gelê Kurd jî xuya be
Zilm û stem û cefa bila nebe, şev biçe bila roj hilê
Jiyana azad e, ramana wî hevpeymanî
Lewma em dibêjin bi dil û can, bi te re ne em Ocalan"

## FERHENGA BIWÊJAN

**Tîra wî li nîşanê ketiye:**
- Bextê wî vebûye.
**Xefikê li ber rûviyan vedide xezal dikevinê:**
- Şansê wî pir e.
**Xesûya te ji te hes dike:**
- Şansê te heye.
)Dema yek diçe cihekî, xwarinek, yan jî tiştek amade be jê re tê gotin)
**Xwedê nokan dide mirovê bêdidan:**
- Kesê bi kêr neyê şansê wî heye.
**Xwedê goşt dide çûkê bênikul:**
- Bi heman wateyê.
**Ziha gur pê ve ye:**
- Bextê wî vebû; deriyê xêrê jê re vebû.

**LI SER ŞANS Û LIHEVHATINA KAR**

**Aşê dînan ji ber xwe ve digere:**
- Şansê wî heye; jê re li hev tê; ne jîr e lê karê wî dimeşe.
**Aşê nezanan ji ber xwe digere:**
- Bi heman wateyê.
**Aşê nezanan Xwedê digerîne:**
- Bi heman wateyê.
**Aşê dînan bêav digere:**
- Bi heman wateyê.
**Aşê dînan Xwedê digerîne:**
- Bi heman wateyê.
**Bayê wî rabûye:**
- Şansê wî lê daye; çi dike kar jê dibîne.
**Bextê wî perdeya reş çirand:**
- Şansê wî lê da.
**Çem tim nayê, qirş û qal li ber nayê:**
- Her roj firset nakevin destê mirov.
**Damistonka xwe danî:**
- Şansê xwe ceriband; bextê xwe ceriband.
(Berê zarokan bi şev agir dikir; pêwîst bû her kes hinek darikan bibe. Ji wan darikan re digotin damistonk)
**Dema bayê te rabû, zebeşan bidêre:**
- Dema şansê te vebe tu çi bikî tuyê tê de bi ser bikevî.
**Deqê wî mîr rabûye:**
- Şansê wî heye; ne ji jêhatîbûna wî ye.
**Dereweke wan ji deh rastên me çetir e:**
-Derewker bin jî ji me zanatir in; digel derewkeriya wan ji me pirtir bisûd in.
**Di asîmanan de kulekek jê re vebûye/lê ber vebûye:**
- Şansê wî vebûye; rewşa wî pir baş bûye; Xwedê dayiyê.
**Diya mirov her roj kuran nayne:**
- Her roj derfet ji mirov re dernakevin; dema derfetek derket divê mirov bi kar bîne.
**Diya mirov her tim kuran nayne:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Ji TEV-ÇAND a Efrîn-Şehbayê klîba li ser Hêzên Rizgariya Efrînê







Tevgera Çand û Hunerê ya Kantona Efrîn û Şehbayê ji bo piştgiriya bi Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) re bi pêşengiya Koma Çiyayê Kurmênc klîbek amade kir.
Ji 18'ê Adara 2018'an dema dagirkirina Efrînê ji aliyê dewleta Tirk a qirker û vir ve, xelkê Efrînê bi gelek rê û rêbazan li ber xwe dide û bi biryar in ku warê xwe ji dagirkeran rizgar bikin. Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) jî ku ji ciwanên Efrînê û herêmê pêk tên, li ser mîrateya Berxwedana Serdemê li dijî dagirkeriyê şer dikin. HRE'yê bi gelek çalakiyên bi bandor li dijî hêzên dagirkeriya Tirkiyeyê û çeteyên wê, nîşan dide ku gelê Efrînê serî li ber dagirkeriyê natewîne û nahêle ku hêzên biyanî yên mîna dewleta Tirk û çeteyên wê li Efrînê bi rehetî tevbigerin.
Di nava 6 salên derbasbûyî yên dagirkeriyê de hêzên HRE'yê gelek çalakî kirin û di encamê de derbên giran li dagirkeran xistin. Xelkê Efrînê jî xwedî li vê hêza xwe derdikeve. Tevgera Çand û Hunerê ya Kantona Efrîn û Şehbayê jî ji bo piştgiriya bi vê berxwedanê re klîbek amade kir.
Klîb ji gotin û awaza hunermendê Efrînî Rêzan Bekir e. Herwiha di studyoya Çiyayê Kurmênc de hatiye qeydkirin û ji aliyê Koma Çiyayê Kurmênc ve hatiye pêşkêşkirin.
Hunermend Rêzan Bekir der barê klîbê de axivî û got, "Berî her tiştî em bejna xwe li beramberî bîranîna şehîdên têkoşîna azadiyê, di nav de şehîdên çalakiyên dawî ya HRE'yê ditewînin. Klîba me ji mehekê ve amadekarî jê re hate kirin. Lê belê ji ber rewşa ku Şehba tê de ye, ji ber dorpêçî û êrîşan me nikarî zû çêbikira. Ev stran jî bi taybetî ji bo Hêzên Rizgariya Efrînê hatiye çêkirin ku em bi hunera xwe piştgiriya xwe ji bo hêza xwe nîşan bidin."
Endama Koma Çiyayê Kurmênc Zîlan Xelîl jî ku di Klîba Hêzên Rizgariya Efrînê de cihê xwe digire wiha got, "Me ev stran amade kir, ji ber ku ew in Hêzên Rizgariya Efrînê, rêya heqîqetê, lehengiyê û qehremaniyê nîşanî me didin. Ji ber wê jî weke endamên Koma Çiyayê Kurmênc me xwest vê stranê diyarî HRE'yê bikin. Armanca me ji vê stranê ew e ku em nameyekê bidin dijminê xwe yê faşîst ku kes nikare hêza me bişkîne. Em hemû HRE'yê ne û berxwedana ku şervanên Hêzên Rizgariya Efrînê di çeperên şer de dike, em ê wê berxwedanê di aliyê hunerê de dewam bikin."

# Li Okyanûsan rekora nû ya germahiyê û encamên wê yên gengaz

Cîhana zanistî carek din di der barê germahiya rûyê okyanûsan hişyarî da.
Li gorî rojnameya Belçîkayê Het Laatste Nîeuws, bi tomarkirina pileya herî bilind a germahiya 40 salan bi 21,09 °C di navbera 23-25 Tebaxa 2023'an de rekorek mutleq hate şikandin. Çavdêriyên ku di 31'ê Çile û 1'ê Sibatê de hatin kirin, germahiya navîn weke 21,1°C nîşan dan. Van germahiyên derasayî yên bilind di encama çend faktorên ku hatine ba hev tê nirxandin. Wekî din, guherîna avhewayê ku dibe



sedema germbûna demdirêj û gav bi gav a avên okyanûsan de jî rolek girîng dilîze.

**Encamên wê çi ne?**

Yek ji encamên germbûna avên okyanûsê dê xurtbûna bahozan be, ku bêtir enerjiyê peyda bike, bi taybetî dema ku faktorên din guncav bin. Bi gelemperî, germahiya bilind a li okyanûsan bi taybetî di warê baranê de dibe sedema şert û mercên hewaya giran.
Di dawiyê de, zêdebûna germahiya ava deryayê ji bo popûlasyona masiyan dikare bibe sedema kêmbûna hebûna çavkaniyên xwarinên deryayî, bi encamên potansiyel ên wêranker.

Sudoku: Bersiv 55

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 7 | 3 | 4 | 6 | 9 | 5 | 1 | 8 |
| 8 | 5 | 9 | 7 | 1 | 3 | 4 | 2 | 6 |
| 1 | 4 | 6 | 8 | 2 | 5 | 3 | 9 | 7 |
| 7 | 6 | 8 | 1 | 3 | 4 | 9 | 5 | 2 |
| 9 | 1 | 2 | 5 | 8 | 7 | 6 | 3 | 4 |
| 5 | 3 | 4 | 6 | 9 | 2 | 7 | 8 | 1 |
| 3 | 9 | 7 | 2 | 4 | 8 | 1 | 6 | 5 |
| 4 | 8 | 1 | 9 | 5 | 6 | 2 | 7 | 3 |
| 6 | 2 | 5 | 3 | 7 | 1 | 8 | 4 | 9 |

Sudoku:Pirs 56

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 3 | | | | | 7 |
| 2 | 9 | | 7 | | | 1 | | 4 |
| | 6 | | | 4 | 3 | | | |
| 9 | 4 | | | 6 | 7 | | | |
| | | 2 | | 9 | | 7 | | |
| | | | 1 | 4 | | | 2 | 8 |
| | | 4 | 9 | | | | 5 | |
| 6 | | 9 | | | 1 | | 3 | 2 |
| 8 | | | | | 5 | | | |

## Siyaseta Dorpêçê ya hikumeta Şamê jiyana welatiyan dike xeteriyê



Dorpêça hikumeta Şamê ya li ser herêma Şehba û Taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yên Helebê bênavber dewam dike. Hevserokê Desteya Tendiruştiyê yê kantona Efrîn û Şehbayê Azad Reşo diyar kir ku di encama dorpêçê de qada tendiruştiyê di rewşeke xerab re derbas dibe.**R-4**

## Roja Cîhanî Ya Zimanê Dayikê

Di 21'ê Sibata 1999'an de ji alîyê UNESCO û Yekîtîya Milletan ve roja zimanê dayikê yê cîhanî ji bo cureyên çandî, ewlahîya ziman û piştgirîya ziman hate qebûlkirin. Roja zimanê cîhanî li hemberî asîmîlasyon û înkarîyê, zimanê gelan ji alîyê hiqûqa navnetewî, hiqûqa mafê mirovan û gelek sazîyên azadîxwaz ve hatîye piştgirîkirin.**R-2**




## Jinên ku mohra xwe li dîrokê xistine...(3)



Di bingeha azadî û jiyaneke bi rûmet a civakê de bêgûman kedeke mezin a jinan heye. Jin ji bo mirovahiyê, ji bo pêşeroja civakê, kêşeyên xîzanî û netewperestiyê, di bin şert û mercên zor û zehmet de, hewldanên bêhempa dane û didin.**R-2**



## Di 58 rojan de rojnamevanan dîroka lehengiyê belge kirin

Beriya 6 salan di van kêliyan de destanên efsanewî yên Berxwedana Serdemê dihatin hûnandin. Nivîsandina dîrokê bi destê şervanên azadiyê hat kirin û belgekirina wê dîrokê ji cihanê re bi destê şervanên ragihandinê hate kirin.**R-3**


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1144 | 18-Sibat- 2024 | www.ronahi.net/ku/



# RÊBER APO MIFTEYA ÇARESERIYA PIRSGIRÊKÊN GELAN E

Komploya Navnetewî dikeve sala 26'an de, girêdayî komployê û armanca wê siyasetmedar Helîm Iko destnîşan kir ku komploya li ser Rêber Apo bi destê hêzên desthilatdar û hegemon pêkhat. Herwiha Iku got ku Rêber Apo kelemeke mezin di çavên desthilatdaran de û ji bo pirsgirêkên tevahiya gelên bindest mifteya çareseriyê ye.**R-6**





## '15'ê Sibatê ji bo gelê kurd rojeke reş e'

Komploya Navnetewî ya dijî Rêber Apo dikeve sala xwe ya 26'an. Girêdayî komployê endamê TEV-ÇAND'ê Xelîl Tehlo anî ser ziman ku roja 15'ê Sibatê ji bo gelê kurd rojekî reş e. Herwiha endama TEV-ÇAND'ê Şêrîn Mihemed da zanîn ku pêşxistin û parastina çandê li ser bingehê Netewa Demokratîk erkê tevahî civakê ye û bi taybet jî erkê jinê ye.**R-5**





**Idrîs Henan**
Erdogan hewl dide Misrê li dijî vîna gelan biçewsîne *R-5*



**Hafiz Ahmet Turhalli**
Meha reş meha Sibatê *R-6*



**Sîpan Şînda**
Roja Zimanê Zikmakî *R-7*

# Jinên ku mohra xwe li dîrokê xistine...(3)

**Navenda nûçeyan**

Di bingeha azadî û jiyaneke bi rûmet a civakê de bêgûman kedeke mezin a jinan heye.

Jin ji bo mirovahiyê, ji bo pêşeroja civakê, kêşeyên xîzanî û netewperestiyê, di bin şert û mercên zor û zehmet de, hewldanên bêhempa dane û didin.

Jin, di şert û mercên ku li civakê tê ferzkirin de herî zêde bandorên neyînî re rûberû dimînin. Ev jî, berê wan dide hin guhertinên bingehîn. Wekî aştî, wekhevî, xwe parastin… Ev guhertinên pergalên hişk, ne hêsan e. Jina ku van guhertinan dide ber çavên xwe, bêguman metirsiya sirgûn, girtîgeh, mirinê jî dide ber çavan. Ew dizane ku veguhertina pergalekî dişibe derguşekê ku neh mehan di zikê xwe de dihewîne û bi qolincan, tîne dinê.

### Sûsika Simo (1925-1977)




Sûsika Simo li Ermenîstanê li herêma Elegezê li gundê Mîrekê ji dayik dibe. Piştî Sûsika Simo tê dinê, malbat koçî bajarê Lenînekan dike. Li vir perwerdeha xwe diqedîne û piştre li nexweşxaneyekî 4 salan hemşîretiyê dike.

Di vê demê de ew hin kêmasiyan di jiyana xwe de hîs dike û dide dû lêgerînan. Ji bêrê de mêla wê li ser kilaman bûye û ew dest bi rêwitiya xwe ya hûnerê dike.

Di wê serdemê de di nav civaka Kurd de hûnermendeke jin nedihat qebûlkirin. Sûsika Simo bi van astengiyan re têdikoşe û di rêya armanca xwe ya hûnerê de dimeş e.

Sûsika Simo, ligel têkoşîna bi civakê re dibe yekemîn dengbêja Kurd ya li Sovyeta Berê. Di sala 1946'î de bi cilên xwe yên kevneşopiya Kurdan, derdikeve ser dikê û kilamên bi Kurdî û Êrmenkî dibêje.

Bi Kûlya Neftalyan re dixebite û ne tenê li Ermenistanê, li seranserê welatê Sovyetê, ji bo hûnera xwe pêşkêş bike digerin.

Sûsika Simo, jineke Êzîdî ye Kûlya Neftalyan jî Ermenî ye. Li gorî baweriya Êzdiyan nedihat ecibandin ku ew bi kesekî Êrmenî re bizewiciya. Civak li hemberî zewaca wê jî derket.. Lê belê Sûsika Simo, wekî çawa ku xwe bi zanebûn û hûnerê, bi civaka Kurd dide qebûlkirin, di zewaca xwe de jî biserdikeve.

Dengbêja Kurd, kilama xwe ya bi nave Lo lo Miho ve, di nava Kurdên kafkasyayê de bu navdar. Di sala 1945an de ew kilam got û wê dengê xwe yê zelal, di nava gelê Kurd de bû dengbêjeka nemir.

Jina Kurd a dengbêj, pişt re komeke muzikê ava dike û bi koma xwe di filarmoniya Ermenîstanê de cih digre.

Sûsika Simo ne tenê li Ermenîstanê her wiha li Gurcistan û di gelek welatên Sovyetê jî tê nasîn. Ji bilî kilamên Kurdî her wiha dîlan û lîstikên Kurdan jî li Qafyasyayê dide nasîn.

Sûsika Simo bi xebatên xwe, di pêşketina hunera Kurdan de roleke girîng lîstiye.


Dengbêj Sûsika Simo bi strana xwe ya Gulîzerê ve di sala 1955an de di Radyoya Êrîvanê de jina ewil bû ku stran got. Di sala 1965an de konser da û deng û navê wê di hemû erdnîgariya Sovyetê de belav bû.

Her wiha Sûsika Simo rêya dengbêjî, stranbêjî û karê hunerê di nava jinên Kurd ên Sovyetê de vedikir û hêz dida jinan.

Di arşîva Radyoya Êrîvanê de gelek qeydên wê hene. Ji ber şert û mercên serdemê wê nikaribû bant derxe lê gelek kilamên wê yên wekî Zilfanê, Sînê, lê lê lo min, Peyayî, hatiye qeyîdkirin.

Sûsika Simo di sala 1977an de hê 52 salî bû jiyana xwe ji dest da. Di pey xwe ji hûnera Kurdan re mîrateke mezin û ji jinan re cesareteke mezin hişt.

### Clara Zetkîn (1857-1933)



Clara Zetkîn, li parêzgeha Saksonya ya Elmanyayê hate dinê. Perwerdehiya mamostetiyê girt.

Ji sala 1874an de dest bi xebatên tevgera jin û karkeran ên li Elmanyayê kir. Di sala 1878an de tevlî Partiya Sosyalîst a Karkeran (SAP)ê ya Elmanyayê dibe.

Piştî ku Bîsmarck di sala 1878an de tevgera sosyalîst qedexe dike, di sala 1882an de pêşiyê surgunê Zurîhê dû re jî surgunê Parîsê tê kirin.

Clara Eîssner, paşnavê evîndarê xwe Ossip Zetkîn girt. Du zarokên wan hebû. Piştî ku Ossip Zetkîn jiyana xwe ji dest da di sala 1899an de careke din zewicî û heta 1928an 19 salan zewicî ma.

Clara Zetkîn jina siyasetmedar, pêşenga tevgera sosyal demokrat a Elmanyayê bû.

Zetkîn, bi hevala xwe ya Partiya Sosyal Demokrat a Elman SDPê Rosa Luxemburg ve, di nav pêşengên çep ên têkoşer cihê xwe girt.

Di nîqaşên Revîzyonîzmê de ligel Luxembûrgê, rexne li Eduard Bernsteîn kir.

Clara Zetkîn, tundiya li dijî jinên karker ên di nav pergala kapîtalîzmê de rexne kir. Û ji bo kareke wekhev, destheqeke wekhev, ji bo tevahiya mafên jinên karker têkoşîn meşand. Ji 1891an heta 1917an di rojnameya jinan Dîe Gleîchheît ê ya Partiya Sosyal Demokrat a Elman SDPê de êdîtorî kir.

Jina berxwedêr Zetkîn, di sala 1910an de li bajarê Kopenhag a Danîmarkayê, di civîna jinan a Konferansa Sosyalîst a Navnetewî de, ji bo bibîranîna jinên kedkar ên ku 8 Adarê 1857an de di şewata febrîqaya tekstîlê de jiyana xwe ji dest dabûn, pêşniyaz kir ku ev roj bibe roja jinan.

Ev pêşniyara Zetkîn hat qebûlkirin û her sal 8ê Adarê, wekî Roja Jinan a Cîhanê tê pîrozkirin.

Clara Zetkîn, ji ber sekna xwe ya li dijî şer gelek caran hate girtin. Lê dîsa jî di sala 1915an de, li Berlînê Konferansa Navneteweyî ya Jinên Sosyalîst lidarxist.

Di sala 1919an de Partiya Komunîst a Elmanyayê hat damezrandin. Zetkîn, di navbera 1920-1933an de nûnertiya vê partiyê kir. Bi Lenîn re di sala 1920an de hevdîtineke li ser "Pirsgirêka Jinê" kir.

Heta sala 1924an endamtiya Partiya Komunîst a Elmanya (KDP)ê ya navendî kir. Ji 1927an heta 1929an dibe endama komîteya navendî ya KDPê.

Piştî şewata Reîchstag, Adolf Hîtler KDPê qedexe dike. Ji ber vê jî Zetkîn, dawiya jiyana xwe li Yekîtiya Sovyetê di surgunê de derbas dike. Di 20ê hezîrana sala 1933an de li Moskovayê jiyana xwe ji dest dide û li wir tê veşartin.

Clara nivîskareke serketî, jinek xwedî ferasetek jîr û bi bandor bû. Ew xwedî taybetmendiyên bi hêz ên rêbertiyê bû.

Ew her tim êşa jinê û mirovên bindest, di hucreyên xwe de hîs dike û li dijî serdestî û zilmê heta dawiya jiyana xwe şer dike.

Rêbera têkoşîn û kedê Clara Zetkîn, bi vê gotina xwe ya 'Li her dera ku jiyan hebe dixwazim şer bikim' ala têkoşînê dewrê jinên li pey xwe kir.

### Ruth Mompatî (1925-2015)

Hevala Nelson Mandela ya têkoşînê Ruth Mompatî, di sala 1952'an bûye endama Konseya Newetiya Afrîka (ANC) û yekem jina şaredara siyasî ya welatê xwe bûye.

Ruth, him 63 salan şahidiya berxwedana başûrê Afrîkayê kiriye, him jî milîtaniya wê kiriye. Ji ber xebatên xwe yên navneteweyî bi navê 'Dayê Ruth' tê nasîn.

Ew jineke bi têkoşîna xwe ya li hemberî rejîma nijadperest a Apartayt îmze avêtiye binê gelek rêgezên ku bandor li jiyana welatiyan kirine. Li hemberî rejîma nîjadperest a 'Apartayt' 63 salan têkoşiyaye.

Rêbera Jinên ANC'ê ,Ruth Federasyona Jinên başûrê Afrîkayê ava kiriye.

Di sala 1956'an de li dijî herêmên ku mirovên spî li wir dijiyan û jinên Efrîqî dersînor dikirin li bajarê Pretoriayê, pêşengiya meşa jinan dike. Û di meşê de tê girtin.

Ruth, di sala 1962'an neçar ma ji welat derkeve û berê xwe da Tanzanîayê. Ruth li sirgunê jî ji bo armancên xwe dixebite. Piştî perwerdeya leşkerî, dibe rêbera ANC'ê ya Tanzanîayê.

Piştî salên 1980'an êdî di qadên diplomasiyên navnetewî yên ANC'ê de cih digire û di hilweşîna rejîma nijadperest de pêşengiyê dike.

Piştî şaredariyê, Ruth xebatên civakî bi rê ve dibe, ligel temenê xwe yê mezin jî ji têkoşînê veneqetiyaye.

Ji rêberên başûrê Afrikayê Ruth Mompatî, bi xebat û têkoşîna xwe ji jinên dû xwe re dibe meşaleyeke ronahî.

# Bi xwarinên xwe çanda Rojhilatê Kurdistanê dide nasîn

**Seher Eta bi riya karê xwe û çêkirina xwarinên cuda yên Rojhilatê Kurdistanê, çanda Rojhilatê Kurdistan bi xelkê Başûrê Kurdistan dide nasîn û xwarinên wê jî gelek tên hezkirin.**

Ji ber aloziya sîyasî û qeyrana aborî gelek malbatên Rojhilatê Kurdistanê berê xwe didin Başûrê Kurdistanê. Seher û hevjînê xwe jî yek ji wan malbatane ku di sala 2011'an de berê xwe dan bajarê Silêmanî. Seher Eta 13 sal in li bajarê Silêmanî dijî. Ji destpêka hatine bajarê Silêmanî ve di pêşangehan de kar dike û yekem kes bû ku pêşangeha Rojhilat li bajarê Silêmanî vekiriye.

### Xwedî gelek behreyan e



Seher û hevjînê xwe ji ber bêkariyê ji Rojhilatê Kurdistanê berê xwe dane Başûrê Kurdistanê, der barê karê pêşnagehê de diyar kir ku di pêşangehan de berhemên Rojhilat dida nasandin. Li her bajarek Rojhilat berhem dianî ku bi teybetî yên wê bajarê weke Tewle, mehfurên Kurdî, misil û qelemkariya Esfehan û wiha got: "Ez hemû karên dest dizanim û ji sala 2007'an ve li bajarê Sineyê min nexşe li ser cilan çêdikir. Wê demê ez yekem kes bûm ku min ew kar dikir, ji derveyî wan ez nexşên li ser dar û textan û çend karên din jî dizanim."

### Daxwazên xelkê Seher gihandin asta niha

Seher Eta nêzî du sê salan karê pêşangehan berdewam kir lê belê ji ber nexweşiya koronayê karê wê rawestiya. Piştre dema ku bi şev diçû Baxê Giştî û di kepiran de rûdinişt, kesek ku li wê derê nas dike jê re pêşniyar kir ku li gel kar bike. Dema ku dest bi kar kir û xelk zanî xelkê Rojhilat e daxwaza xwarinên Rojhilat jê kirin. Piştre li ser daxwazên zêdetir ên xelkê, bi tenê kepirek girt û li ber Baxê Nalî û dest bi vî karî kir. Seher der barê karê xwe de wiha got: "Kêfa xelkê ji xwarinên Rojhilat re gelek tê û jê hez dikim. Ji ber bi tendirust in, xwarinên min ji xwarinên; qurmezebzî, dizî, birinc û peqle, zerşik, eprax, aşî rişte, kotligên qiyme pêk tên. Gelek girîng e ku jin derbikevin ji derve û kar bikin û xwe bi pêş bixin, ji ber ku dema tên derve ezmûna jiyanê dibînin û zêdetir bihêz dibin."

### 'Astengî û rêgirî hene lê belê em dest ji hewldanan bernadin'

Seher Eta bal kişand ser astengiyên li pêş û da zanîn ku destxistina kepirek ji bo xebatê ne asan e, bi taybetî di vê rewşa niha ya Başûrê Kurdistanê ya bêkariyê de û wiha got: "Gelek caran ji aliyê ciwanan ve gotin ku yek ji Rojhilatê Kurdistanê hatiye kar ji xwe re dîtiye lê belê ciwan bêkar in. Li aliyê din jî gelek kes tên destxweşiyê ji bo xwarinên min dikin. Bi taybetî dema ku malbat bi hev re kar dikin. Girîng e Kurd li her cihê ku lê bin piştgiriya hev bikin û cudahiyê nexin nava parçeyan. Ji ber tenê sînorek em cuda kirine, weke din em hemû Kurd in."

Seher Eta ji derveyî çêkirina xwarinan di nava kepirê de, bi riya online li mala xwe xwarinê amade dike û di dawiya axaftina xwe de ev tişt anî ziman: "Rojane daxwaz li ser xwarinên min hene û bi giştî xelk ji tama wê gelek hez dikin. Plana min ew e ku ez cihek mezin ji bo xwe vekim, da ku xelk bên bi awayek kêfxweş û aram xwarinê tê de bixwin. Lê belê pirsgirêk ew e ku rê nayê dayîn xelkên parçeyên din bi tenê cihê kar ji bo xwe vekin divê li gel yekê ji Başûrê Kurdistanê hevkarî bikin, ev jî dibe sedema astengiyan." **NÛJINHA**



# Roja Cîhanî Ya Zimanê Dayikê


Di 21'ê Sibata 1999'an de ji alîyê UNESCO û Yekîtîya Milletan ve roja zimanê dayikê yê cîhanî ji bo cureyên çandî, ewlahîya ziman û piştgirîya ziman hate qebûlkirin. Roja zimanê cîhanî li hemberî asîmîlasyon û înkarîyê, zimanê gelan ji alîyê hiqûqa navnetewî, hiqûqa mafê mirovan û gelek sazîyên azadîxwaz ve hatîye piştgirîkirin.

**Deriya Çiya/ Qamişlo**

Bêguman ziman alava sereke ya ku mirov karê pê raman û hestên xwe ji civakê re diyar bike, çi bi axaftinê be an jî bi nivîsê be, an jî bi awayên din ên derbirînê be. Civak û dewletan girngiya ziman nas kirine, lewra hemû netew giringiyek taybet didin zimanê xwe yê dayikê û guhdanek mezin pê dikin, her dem wî diparêzin û pêş dixin û bi pêşveçûna zanist û babetên jiyanê re diguncînin.

Ji ber vê giringiyê Rêxistina Netewên Yekbûyî ya Perwerde û Zanist û Çandê UNESCO, roja 21'ê sibatê ji her salê wek Roja Cîhanî ya Zimanê Dayikê destnîşan kiriye, ji bo nirxdana zimanê dayikê û ronîkirina rola wî di veguhestina çand û zanînê de, û tekezkirina li ser perwerdeya bi bêhtir ji zimanekî li ser bingeha zimanê dayikê, bi armanca avakirina civakên mirovî yên xwedan çandên cuda û hemaheng ên pêkvejiyanê diparêzin.

UNESCO roja 21'ê sibatê bi taybetî destnîşan kir ji ber ku bûyerek balkêş ya têkildarî zimanê dayikê di vê rojê de heye, ew jî berxwedana xwendekarên Bangladêşî di ber zimanê xwe yê Bangalî de ye, yê ku ji aliyê desthilata Pakistanê ve dihat çewisandin.




### Kurtedîroka roja zimanê dayikê yê cîhanî

Piştî welatê Pakîstan sala 1947'an de ji Hîndistanê veqetiyaye û serxwebûna xwe îlan kiriye, zimanê urdû wek tenê zimanê Pakîstanê hatiye daxuyandin, hemû zimanên din ên wê erdnîgariya pirziman hatine qedexekirin. Yek ji van zimanan zimanê bengalî bû. Gelê bengalî hem serdestiya dewleta nû hem jî yekzimanîbûna wê qebûl nekir û derket kolanan ji bo ku li axa xwe û zimanê xwe xweyî derkeve. 1952'an de, di xwepêşandanekê de, polîsên pakîstanî gule reşandine ser van ciwanan û di encam de hinek ciwan şehîd bûn. Piştî vê bûyerê têkoşîna gelê bengalî zêdetir bûye. Encamê de gelê bengalî sala 1971'an de serxwebûn û azadiya xwe bidest xistiye û ev roj kiriye Roja Şehîdên Zimanê Dayikê. 21'ê Sibatê ji wê rojê heta niha wek Roja Şehîdên Zimanê Dayikê tê pîrozkirin, keda şehîdên bengal tê bibîranîn. Sala 1999'an de, UNESCO'yê ev roj wek Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanî qebûl kiriye û her sal di vê rojê de çalakiyên curbecur ji bo hişyariya ziman pêk tîne.

### Ziman û nasname

Divê ku mirov zanibe ziman, ne tenê weke nasname mirovan e. Ji xaynî wê yekê jî ziman hebûna rastiya mirov û pêşketina wî ye. Dema ku mirov li pêşketinên mezin dimeyîzîne di cî de zimanê dayikê dibîne.

Mirov dema ku li demên berî Neolîtîkê meyîzenê, wê bibîne ku her çendî mafê axiftinê bidest ket, pêşketin û bi rê ve çûyin çêbû. Dîroka zimanê dayikê, bi dîtina xwe re bi têgihiştinê re dest pê dikê. Piştre bi biafirandin, axaftin û nivîsandinê re berdewam dike.

Asîmîlasyon û oto asîmîlasyon ziman dihêre

Îro gelekî eşkere ye ku asîmîlasyon û oto asîmîlasyon di nava civaka kurdan de têra xwe pêş de çûye. Asîmîlasyon ji hêla dewletê ve tê meşandin û oto asîmîlasyon jî em kurd bi xwe li hemberî xwe dikin. Asîmîlasyona ku dewlet bi xwe dike çiqasî xirab be, malwêran be, tunekirin be, oto asîmîlasyona ku kurd bixwe dikin jî du caran ji asîmîlasyonê xirabtir e. Xwe tunekirina herî malkambax bê şik îro oto asîmîlasyon e. Gelê kurd îro dualî ketiye nava guvaşeke bêhempa. Divê em karibin vê pêvajo û dorpêçkirina malkambax bi hemû rêbazên ku li ber destên me hene rawestînin. Gelê kurd divê bi hişmendî li ziman, mîrate, kok û kultura xwe vegere. Divê em di van armancan de hevbeş bibin û hêza xwe bikin yek.

Baş tê zanîn ku ev sed sala dawî dewletê bi hemû derfetên xwe xwestiye ku zimanê kurdî ji holê rake, zimanê kurdî tune bike, heta piraniya caran vekirî gotine ku zimanê kurdî tune ye. Gotinê zimanê kurdî hejar û lawaz e. Li paşmayî ye û asta wî nizm e. Zimanê gundiya ye. Gotinê perwerde bi zimanê kurdî ne pêkan e. Lê ev dîtin bi wextê re hemû jî pûç û vala derdikevin. Zimanê kurdî her zindî maye û roj bi roj tê guhertin û piralî pêşde jî diçe.

Bi Zimanê kurdî îro perwerde jî têkirin, rojnamegerî, nivîskarî, karê zanistî, hunermendî, dîplomasî, siyaset, lêkolîn û hemû çûre çalakiyên rewşenbîrî bi kurdî her roj derfetên nû ji xwe re peyda dike. Her tişt li ber çavan xuya dike, şênber e. Yên ku wan xebatan naxwazin bibînin, di encamê de naxwazin rastiya xwe jî bibînin.

### Bi boneya vê rojê pêwîste gelê kurd jî xwedî li zimanê xwe derkeve

Van rojan em nêzî salvegera vê helkeftê ne, gerek e gelê kurd li seranserê cîhanê giringiyeke taybet bide vê rojê, ji ber ku mirovahî gihiştiye çerxa 21emîn, û hîn jî rewşa zimanê kurdî ji rewşa yê Bangalî yê wê serdemê dijwartir e, û piraniya kurdan derdê danûstandina bi zimanê xwe yê dayikê dikişînin.

Ji bo ahenga vê rojê, pêdiviya gelê kurd bi lidarxistina çalakî û karên berfireh û guhdana mezin bi hînkirina zimanê dayikê heye, bi taybetî ji nifşê nû yê zarokên kurdan re, çi li kurdistanê be an jî li derveyî kurdistanê be. Çi bi awayekî fîzîkî be an bi sûdewergirtina ji pêşketina teknîk û enternêtê be, û wî ev guhdan her tim berdewam bike, da kurd bibin beşek ji programê UNESCO yê geşepêdana berdewam a civakên cîhanê.



## Roja Zimanê Zikmakî

**Sîpan Şînda**

21'ê Sibatê ji aliyê netewên ne serbixwe ve weke Zoja Zimanê Zikmakî tê pîroz kirin. Armanca vê rojê ji ew e ku bal bê kişandin li ser zimanên li cîhanêde têne axaftin û bi taybetî ji zimanên statuyeka xwe ya fermî neyîn. Di 17'yê Mijdara 1999'an de, Meclîsa Netewên Yekbûyî ya Giştî biryar daye ku 21'yê Sibatê weke Roja Zimanê Zikmakî ya Navnetewî bête pîroz kirin. Ji sala 2000 ê ve jî Netewên Yekbûyî dilxwe de çavdêriyê li ser vê rojê dike û raporan dinivîse. Lê belê weke tê zanîn, Netewên Yekbûyî zêde çi bandora xwe li ser dewletên desthilatdar nîne ku pêştûriyê li wan bike da ku pêşiyê li zimanên gelên bindest negirin. Gelo ev roj ji kîderê tê û çawa derketiye? Di 21 î Sibata 1952'yan de, gelê Bengladeşê li bajarê Dakayê li himberî Pakîstanê ji bo mafê parastina zimanê xwe xwepêşandanek pêkanîne. Di wê rojê de polîsên Pakistanî pênc xortên Bengladeşî dikujine û bi sedan kesan ji birîndar dikine. Ji wê rojê ve Bengladeşî 21 î Sibatê weke Roja Zimanê Navnetewî pîroz dikine. Ji hingê hetanî niha ve, ev roj li Bengladeşê weke cejneke fermî ya netewî ji tê pîroz kirin. Di 9 î Çileya 1998 an de du kesên ku eslê Bengladeşî ne û li Kanadayê dijîne (Rafîqul Îslam û Abdus Salam), nameyekê ji secreterê Netewewên Yekbûyî yê demê Kofî Annan re dişînin û pêşniyaz dikine ku 21 î Sibatê ji aliyê Netewên Yekbûyî ve weke Roja Zimanê Zigmakî ya Navnetewî bête pejirandin da ku zimanên li cîhanê de bêne parastin. Di heman demê de ew pêşniyaz dikine ku roja 21 î Sibatê, weke roja bîranîna kesên ku di 21 î Sibata 1952 yan de, di xwepêşandana ji bo zimanê xwe hatîn kuştin de bête pîroz kirin. Di dawiyê de Meclîsa Giştî ya Netewên Yekbûyî, di 17 yî Mijdara 1999 an de biryarê dide ku 21 î Sibatê weke Roja Zimanê Zigmakî ya Navnetewî û bîranîna şehîdên Dakayê bête pîroz kirin.

Bê goman hişyar kirina mirovan ya ji bo zimanê wan tiştekî baş e. Lê weke we li jorê ji xwendî, mixabin netewên bindest çi tişt bê bedel bi dest nexistine. Mêtîngeran û serdestan her tim zilm li ser bindestan kirine û xwîna wan rêtîne. Îro gelê Kurd vê tiştê ji hemî kesê çêtir dizane. Jiber ku eve sed sal in xwîna me ji aliyê mêtînger û serdestan ve tê rijandin, ziman, çand û netewa me tête qirkirin. Hinek Kurdên xemxurê zimanê xwe jî vê roja ku bi rijandinê xwînê hatî bi dest xisten pîroz dikine û dixwazine hişyarî û hişmendîyekê di derheqê parastin û axaftina zimanî de çêkine. Lê mixabin bi taybetî li Bakûrê Kurdistanê, zimanê Kurdî ketiye di bin xetereyeke gelekî mezin de. Bişaftin derketiye asta herî bilind û ji xwe îro êdî pergal ne hewceye bi xwe çi bişaftinê ji bike. Derûniyek welê ketiye di nav Kurdan de û hişmendi û binhişîya Kurdan hatiye dagirkirin û ew bi xwe zarokên xwe ji Kurdî û axaftina Kurdî dûr digirine. Ango zarokên Kurdan bi Kurd xwidê didine û bi Tirk mezin dibine. Mixabin rewş li Bakûr evqasî ketiye di xeterê de. Welê xwiyaye ku ji xeynî hinek kesên xemxurê zimanî, ev rewş qet ne li xema çi sazî û dezgehên Kurdan de ye ji. Bi taybetî ji ev rewş qet ne li xema partîya sîyasî ya ku li Bakûr li ser navê Kurdan sîyasetê dike de ye. Lê divê Kurd dest ji vê xemsarîyê berdine û zend û bendên xwe hildine û bi hemî hêza xwe li zimanê xwe xwedî derbikevine.

# 'Pêşbirka Helbesta Ciwanan pêşxistina helbesta kurdî ye'

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan ya ku HRRK'ê di 1'ê Çileyê de dest pê kir, didome. Girêdayî vê yekê jî, Mistefa Ebdo diyar kir ku armanca me ji pêşbirkê pêşxistina ciwanên kurd yên Rojava ye. Herwiha Ebdo da zanîn heya niha 23 helbestvan di pêşbirkê de beşdar bûne û pêşbînî hene ku wê hejmara kesên beşdar ji pêşbirka sala borî zêdetir bibin.**

Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan yek ji xebatên Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê, HRRK'ê ye.

Ev pêşbirk bi taybet ji bo ciwanên kurd ên Rojava ye, di 1'ê çileya 2023'an de hat destpêkirin û salane ye. Heriwiha ev pêşbirka Helbesta Ciwanan a 4'an ku li ser asta Rojava tê li darxistin.

Girêdayî Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan, Cîgirê Serokê HRRK'ê, Mistefa Ebdo ji Rojnameya me re axivî.

### Rêbaz û mercên beşdarbûna pêşbirkê



Mistefa Ebdo di derbarê merc û awayê tevlîbûna helbestvanan ji bo pêşbirkê de wiha dest nîşan kir: "Me ji destpêka salê ve destpêkirina Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan a 4'an bi hevkariya Rêxistina Canê Xelef a Xêrxwaziyê ragihand. Armanca me ji vê pêşbirkê ew e ku helbestvanên xwe yên ciwan bi çand û zimanê xwe ve werin girêdan û helbesta kurdî li pêş bixin. Herwiha vekirina derfetê pêşxistinê li pêşiya helbestvanên xwe yên ciwan. Kesên ku dixwazin tevlî vê pêşbirkê bibin, helbestên xwe bi riya îmêlê ji me re dişînin û piştre dinirxînin. Ev pêşbirk xwedî mercên taybet in û divê helbestvanê ku bixwazin tevlî pêşbirkê bibe, şert û mercan pêk bînne. Mercên pêşbirkê jî ew in ku helbest bi kurdî be, helbestvan ji Rojava be, temenê wî/wê ji 18'an heya 30'î be, helbest berî niha li tu deveran nehatibe xwendin. Di heman demê de malikên helbestê ji 10 heya 50 malkan pêk werin û çênabe helbestvanên ku di pêşbirkên bûrî de bi ser ketibin, careke din beşdar bibin. "

### Pêngava nirxandina helbestan û rewşa pêşbirkê

Mistefa têkildarî pêngava nirxandin û rewşa Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan de wiha axivî: "Piştî ku kesên beşdar helbestên xwe dişînin ji me re û helbest tên komkirin, her helbestek jimarek jê re tê çêkirin, êdî tu kes wê helbestê nas nake. Piştre diçin ji qomîteya nirxandinê re, ev qomîte jî ji nêzî 5 kesên helbestvanên pispor û rexnevanan pêk tê. Di destpêkê de van helbestan dixwînin û dinirxînin. Herwiha da ku bi awayekî veşartî helbest werin nirxandin û bêalîbûn pêk were di vê pêngavê de, û nizanibin ev helbest a kê ye. Dema helbestek ji me re tê, hejmareke taybet ji bo her yek tê destnîşankirin. Hejmar û navê xwediyê helbestê, li cem me ye û endamên komîteya nirxandinê bi van agahiyan nizanin. Di warê rewşa pêşbirka helbestê de jî em dibînin ku her diçe asta beşdarbûnê li pêş dikeve. Di pêşbirka Helbesta kurdî ya Ciwana ya 4'an ast û hejmara helbestên ku beşdar dibin ji yên berya xwe baştir û bêhtir e. Hêjayî gotinê ye ku heya niha 23 kes tevlî vê pêşbirkê bûne. Herwiha li gor tevlîbûnê jî, pêşbîniyên me hene ku wê hejmara kesên beşdar ji yê pêşbirka sala bûrî bêhtir bin. Kesên beşdar ji tevahiya Rojava ne û mijarên helbestên wan cihêreng in, lê bêtirî wan li ser welat û kurdperweriyê ne. "

### Encam û xelat

Mistefa Ebdo girêdayî encam û xelatên Pêşbirkê de wiha anî ser ziman:"Deriyê beşdarbûna di Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan de heta 10'ê Adarê berdewam e. Piştre wê helbestên ku hatine komkirin werin nirxandin. Di dawiyê de wê navên kesên serkeftî jî di 29'ê Adarê de bi kongireke rojnamevaniyê de û bi awayekî zindî, li navenda HRRK'ê werin ragihandin. Wekî tê zanîn jî 3 helbestvan bi 3 astan xelatên pêşbirkê werdigirin û di dawiyê de şahiyek ji kesên serkeftî re tê li darxistin. Xelata helbesta ku asta yekem werdigire 500 dolarê Amerîkî ye, ya 2'yan 300' e û ya 3'yan jî 200 dolar e. Herçendî ku xelat pere bin jî, lê armanc jê ew e ku em hanedanê bi ciwanên xwe re çêkin û bi riya vê pêşbirkê afrîneriya xwe derxînin holê. "

### Astengî

Cîgirê Serokê HRRK'ê Mistefa Ebdo di derbarê astengiyên beşdarbûba di Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan a 4'an de wiha axivî: "Armanca me ji vê pêşbirkê ew e ku ev çalakî bibe derfetek li pêşiya ciwanên kurd ku karibin derbirîn û hestên xwe bidin diyarkirin û xwe pêş bixin. Lê hin astengî derdikevin pêşiya ciwanên Rojava û rê li ber beşdarbûna wan di pêşbirkê de tê girtin. Yek ji van astengiyan jî êrişên dagirkeriya Tirk yên bênavber li ser herêma me ne. Ev êriş ewlehiya Rojava û herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike xeteriyê û bandorê li beşdarbûna ciwanan ji pêşbirkê re û berdewambûna tevahiya çalakiyên HRRK'ê dike. Gelek ciwan yên Serêkaniyê, Girê Sipî û hwd… ji ber dagirkeriyê nikarin tevlî pêşbirkê bibin. Herwiha ciwanên Efrînê yên ku li Şehbayê û Helebê dimînin, ji ber dorpêçaê nikarin tevlî pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan bibin. Li aliyekî din jî gelek kes hene dixwazin tevlî pêşbirkê bibin lê temenê wan yan mezin e yan jî biçûk e û temenê wan ne li gor mercên beşdarbûnê ye. "

# Rêber Apo mifteya çareseriya pirsgirêkên gelan e

Kompoya Navnetewî dikeve sala 26'an de, girêdayî komployê û armanca wê siyasetmedar Helîm Iko destnîşan kir ku komploya li ser Rêber Apo bi destê hêzên desthilatdar û hegemon pêkhat. Herwiha Iku got ku Rêber Apo kelemeke mezin di çavên desthilatdaran de û ji bo pirsgirêkên tevahiya gelên bindest mifteya çareseriyê ye.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Rêber Apo piştî pilaneke cîhanî ya ji aliyê hêzên komploger û hegemona cîhanî ve ya ku di 15'ê Sibata 1999'an de hat pêkanîn. Di encama vê komployê de Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan, bi komloyeke navnetewî hate revandin. Herwiha ji wê demê heta roja îro di bin tecrîdeke giran de ye. Girêdayî Komploya Navnetewî û tecrîda giran ya ku li ser Rêbertî tê meşandin, siyasetmedar Helîm Iko, bersiva pirsên rojnameya me da û naveroka hevpeyvînê jî wiha ye:

**15'ê Sibatê nêzîk dibe, weke vê rojê Komploya Navnetewî di şexsê Rêber Apo de hat pêkanîn. Sedem çi bû ku Rêber Apo ji aliyê Dewleta Tirk û hêzên hegemon ve hate hedefgirtin?**




Belê em dizanin ku piştî demeke dirêj ji karê hêzên navdewletî bi serkêşiya Emerîka, istixbarata Israîl û mîta Tirk, Rêber Apo hate revandin. Sedem ji Komploya Navnetewî ya ku li ser Rêber Apo hat meşandin ew bû ku xwestin raman û felsefeyeke li dijî polîtîkaya qeptalîzma nûjen, kar dike, asteng bikin û nehêlin ku berbelavî cîhanê bibe. Rêber Apo ne kesayetekî ji rêzêye, ew xwedî fir û felsefeyeke gerdûnî ye. Rêbertî dîroka şoreşên cîhanê, şoreşên kurdan û bindestiya gelê kurd, bindestiya gelê cîhanê û serdestiya dewletên navnetewî xwendiye. Li gor vê yekê jî xwestiye bi fikir û ramanên nûjen yê demokratîk, felsefeya Netewa Demokratîk avabike û di nava civakê de belavbike. Armanca Rêber Apo di wê serdema destpêkirina kar û xebata xwe de ew bû ku gelê kurd û tevahiya gelên bin dest ji zilm û zordariya kapîtalîsta nûjen û dewletên desthilatdar azad bike. Azadbûna gelên kurd û tevahiya gelên cîhanê ji bo hêzên serdest û bercewendiyên wan xeteriya herî mezin e. Dema ku van dewletan dîtin ku gavên ji bo azadiya gelan tê avêtin, metirsiya wan çêbû. Ji ber ku ji taybetmendyên hêzên hegemon û desthilatdar, pêşmeyzandina rewşa siyasî ya cîhanê ye û planên xwe ji bona pêşeroja cîhanî dirêsin û li gorî bercewendiyên xwe tevdigerin. Dema Tevgera Rizgariya Kurdistanê bi pêşengtiya Rêber Apo dest bi xebata şoreşgerî li dijî faşîzma Tirk kir, êdî metirsî li cem dewletên desthilatdar çêbû û li gorî vê yekê ketin nava tevdîran de. Dîtin ku ev tevger bi fikr û felsefeyek nûjene û wê nekeve xizmeta bercewndiyên desthilatdariya wan de, kar dike. Herwiha her ku diçe PKK'ê bihêztir dibe û xeteriyê li ser hebûna wan çêdike. Desthilatdarên cîhanê texmîn kirin ku ger di van salên destpêkê de ev tevger li ser asta cîhanê ewqasî xwedî hêzeke bibandor e, gelo wê di demên pêş de çawa be. Lewma pêşengê wê bi komployeke navnetewî revandin û radestî Tirkiyê kirin.

**Ev bû nêzî 3 salane ku tecrîdeke giran li ser Rêber Apo tê meşandin, gelo bêdengiya hêzên navnetewî, rêxistinên mafê mirovan û dadgehên cîhanê ji vê tecrîdê re tê çi wateyê?**

Rêber Apo sembola azadî, wekhevî û aşîtiyê ye, di heman demê de H.Îsa jî wisa bû ku aştîxwaz û azadîxwaz bû. Impratoriyeta Romanî ya desthilatdar di wê serdema kevnar de Hezretê Îsa çarmîx kir. H.Îsa jî ji ber ku alîgiriya gelê bindest dikir û doza azadî, wekhevî û dadweriyê dikir hate çarmêxkirin. Desthilatdariya ku di wê serdemê de dihat kirin, heta roja îro jî tê domandin û şêweyê xwe guherand û cewherê wê weke xwe ma. Di roja îro de jî dewletên sermeyadar û serwer yên ku cîhanê li gor bercewendiyên xwe dimeşînin, Rêber Apo dan girtin. Herwiha ji wê demê ve komplo li ser berdewam e û di bin tecrîdeke giran de ye. Em dikarin bibêjin ku siyaseta tecrîdkririna Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan û çarmêxkirina H.Îsa heman kiryar e û li dijî pîvanên mirovahiyê ye. Rêber Apo bi fikir û felsefeya xwe ya azad ji bo desthilatdaran kelemeke û hertim alîgirê azadiya gelên bindest û wekheviyê ye. Lewma îro Rêbertî ji aliyê hêzên komploger ve hatiye tecrîdkirin û dewleta Tirk a faşist kirine nobedarê Îmralyê. Faşîzma Tirk bê fermana Emerîka û hêzên din yên komploger nikare tevbigere. Dadgehên cîhanî û rêxistinên parastina mafên mirovan jî di bin serweriya desthilatdariya hêzên komploger de ne û tev jî li hemberî tecrîdkirina Rêber Apo bêdeng in. Herçiqasî ku hêzên komploger dizanin ku dewleta Tirk xwedî fikrê islamî yê radîkal e, tevî wiha jî ji bona parastina bercewendiyên xwe dengê xwe li hemberî tecrîda giran a ku li



ser Rêber Apo tê meşandin nake.

**Ji roja ku komploya navnetewî destpê kiriye, pêngavên ji bo azadiya fîzêkî ya Rêber Apo ranewestiyane, herî dawî pêngava cîhanî ya ku di 10'ê Cotmeha sala bûrî de hatî destpêkirin û hîn jî berdewame. Ji bona ku Rêber Apo bi fîzîkî azad bibe, pêwîste gelê kurd û hemû gelên azadîxwaz çi bikin?**

Em tev dizanin ku ji destpêka komployê heta roja îro Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan, çalakiyên şermezarkirin û doza azadiya fîzîkiya ya Rêbertî ranewestiya ye û her berdewam e. Di roja îro de li ser asta cîhanê pêngaveke mezin ji bo azadiya Rêber Apo didome. Gelê kurd û cîhan tev ji bo azadiya Rêber Apo têkoşînê dikin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û li ser asta zêdeyî 100 dewletên cîhanê ji bona azadiya fîzîkî ya Rêbertî kar û xebat tê meşandin. Konvedan, meş, daxuyanî, haştag, îmze û hwd… didomin û armanc ji van çalakiyan azadiya Rêber Apo ye. Hemû gelên cîhanê rastiya Rêbertî û gelê kurd nas kirine û gelek kesayetên enternasyonal jî tevlî tekoşîna tevgera azadiyê bûne û di nava refên HPG, YPG û YPJ'ê bûne. Gelên Rojhilata Navîn û cîhan bi giştî di nav pirsgirêk, kirîz û qeyranan de dijîn û Rêber Apo kilîda çareseriya van pirsgirêkan e. Gelê kurd û cîhan tevahî jî di roja îro de dizanin ku remanê Rêber Apo cihê çareserî û azadiya wan e, lê hêzên serdest hertim dibin asteng li pêşiya azadiya gelan. Tişta ku di vê dema hestiyar de pêwîste ku were kirin, xurtkirina asta têkoşîna gelan e. Divê gelê kurd û tevahî mirovên azadîxwaz li dijî dewleta Tirk a faşist û hêzên komploger ji bo azadiya Rêber Apo ya fîzîkî berxwedana xwe bihêztir bikin. Ji ber ku pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Apo misogeriya azadiya gelan û şikandina serdestiya cîhanî ye.



## Meha reş meha Sibatê

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Milletê me meha Sibatê wek mehekî reş û tarî pênase dike. Çîrokên vê mehê jî meşhurin. Di nava me Kurdan de ev meh di xwezaya xwe de jî weke mehekî dîn û har tê naskirin.
Lewre meha Sibatê di rewşa xwe ya hewayê de jî weke mehekî tevlîheve.
Di hawîrdorên me de ji vê mehê re di gotin meha dîn û gêj.
Ji ber hewa wî, carna xwe dike rengên rojên biharê.
Lê rojekî dîtir kare bibe çile, berf, baran, bahoz û tîpî kû jiyanê jî bi dawî bike.
Li gor çîrokê carekî dîsa di meha Sibatê de, hewayek xweş çêbuye. Henekî ji gundiyan pezê xwe birine ber bi zozanan dakû wan biçêrînin. Pez nêzî waran dibe û ji gund dûr dikeve. Nişkeve bahoza Sibata gêj û dîn, destpêdike, berf û bahoz çav çavan nabîne. Şivanên kû pêz birine zozanan ji bo çêrê, bi teva pezê xwe, jiyana xwe ji dest didin.
Ev çîroka han, di jiyana me Kurdan ya siyasî de jî, buye rastiyekê dîroka me. Di şoreşa Şêyx Seîd û hereketa wî ya bi navê Azadiyê de ev meh, ji hêla Kemalîstan ve weke mehekî têkbirina şoreşa Kurd hatiye plan kirin.
Di sêzdehê meha Sibatê de li navçeya Amed Pîranê, dewleta komploger dek û dolab li pêşiya Şêxê kal danî û prokasyona kuştina leşkerên xwe pêk anî. Henekî leşkerên xwe dan kuştin û nehîşt tevgera azadî amadebaşiyên xwe bigîhîjîne encamê. Ev hereket bi dîlgirtina Şêx, têk bir û rêberê bizavê hemû hatin sêdare kirin.
Pazdehê meha Sibatê 1999 de jî serokê gelê Kurd Rêber Apo, bi hevkariya desthilatên cîhanê, hate dîl girtin. Bi vî awahî plan danîn ji bo gelê Kurd bi temamî têk bibin.
Bîst û nehê meha Hezîranê Şêx sêdarê xistin û biryara dardekirina Rêber Apo jî, heman rojê dan.
Lê vê carê, serokê gelê Kurd û gelê azadîxwaz neyarên xwe yên dîrokî nas kiribûn û li gor wê xwe birêxistin kiribûn.
Raste cezayê sêdarê dan Rêber Apo jî, lê feraseta wî û rêxistina kû wî ava kiribû, encamên cudatir derxistin holê. Qatilên Kurdan dewleta Kemalîst gotin; me Şêxê kal sêdarê xist û me Kurdistan xiste gorê.
Emê Rêbe Apo jî sêdarê bxin û vê pirsgirêkê ji holê rabikin.
Ji bîr kiribûn ku Rêber Apo: amadekariya xwe ya rêxistinî, leşkerî, bîrdozî û sîyasî gellekî cuda çêkiribû.
Kemalîstan digot: „me Abdullah Ocalan dîl girt, emê rêxistina wî jî bela wela bikin".
Bizava hemdem, serokatî û rêxistina wê, wek pola berxwe dan û têk neçûn. Berovajî planên dijminan, xwe ji bo şerekî dûr û dirêj amade kiribûn. Ev bîst û pênc salin, Rêber Apo dîl hatiye girtin. Lê rêxistin û milletê wî, her diçin mezintir û frehtir dibin. Abdullah Ocalan di nava cîhana mirovahîyê de, di dilê mirovên xwe de wîjdan û di dîrokê de jî cîhê xwe zêdetir girtiye.
Belê neyarên me dixwazin ji bo milletê me, meha Sibatê bikin meha têkbirina Kurdan. Lê piştî meha Sibatê, meha Adarê tê.
Adar Newroz e, Buhar e, jiyane ji bo xwezayê, azadiye, serkeftin û pêşveçuna gelê meye. Têkçûna Dehhak û serkeftina Kawaye.
Meha reş ji hêla bizava neteweya Kurd û serokê wê Rêber Apo ve, hatiye têk birin. Haydê Kurdo; dem dema azadiyêye, werin em bi hev re Rêbertiya xwe azad bikin û dîlana azadiyê li qadên Ameda paytext bigerînin.



# Di 58 rojan de rojnamevanan dîroka lehengiyê belge kirin

Beriya 6 salan di van kêliyan de destanên efsanewî yên Berxwedana Serdemê dihatin hûnandin. Nivîsandina dîrokê bi destê şervanên azadiyê hat kirin û belgekirina wê dîrokê ji cîhanê re bi destê şervanên ragihandinê hate kirin.

**Zana Roj/ Şehba**

Şopandina berxwedana serdemê, kêliyên qehremantiya şervanên azadiyê, lehengiya şer û fedayîtiya ku dihat kirin, çîrok û berxwedaniya gel di 58 rojan de li hemberî dagirkeriyê bi kamîreya şervanên ragihandinê hate belgekirin û bû malê dîrokê. Çapemenî di hemû kêlî û ziraviyên hurguliyên şerê ku di ser herêma Efrînê de hatiye de, rola xwe ya herî pîroz pêk anîn û li rex gel û şervanên azadiyê bûn eynika têkoşînê. Ragihandina azad bi hemû şaxên xwe di şerê Efrînê de pilanên dijmin têk birin. Herçiqasî ku dagirkerî bi pilan û hovîtiya xwe li ser Efrînê de hat da ku dengê heqîqetê bitepisîne, lê belê artêşa duyemîn Ragihandin ev yek bi pênûs û kamîreyên xwe têk birin û lehengiya 58 rojan kêlî bi kêlî ji cîhanê re ragihandin û belge kirin. Têkildarî rol û têkoşîna artêşa duyamîn a ragihandinê di berxwedaniya serdemê de li Efrînê rojnemevana Jin TV Zîlan Hesen û rojnemevan Egîd Roj ji rojnameya me re axivîn.

**`Efrîn di nava hesabên dijmin de bû`**

Zîlan di destpêkê de bal kişand ser armancên dagirkeriya Tirkiyê bi destpêkirina êrîşên li ser Efrînê û wiha got: "Efrîn rista xwe ji şoreşa 19'ê Tîrmehê girtibû ku bibû hêviya gelên azadîxwaz û herêmeke bi berxwedaniya xwe û aramiyê dihat naskirin. Bê guman Efrîn bi van destkeftiyan her tim di nava hesabên dijmin de bû. Dagirkeriya Tirkiyê bi gelemperî her tim dagirkirina herêmên Bekur û Rojhilatê Sûriyê xistiye armancên xwe. Lê Efrîn ji ber rengê wê yê azadiyê, zengînbûna ser erd û bin erda wê, herwiha cihê wê ya stratejîk di asta yekemîn de ket nava hedefa dagirkeriyê. Bi wê yekê re êrîşên 20'ê Çilê yên 2018 an bi serpereştiya Tirkiyê û komên çete hat destpêkirin".

**Di hemû kêliyên berxwedanê de cih digirtin**

Zîlan diyar kir ku wan cihê xwe di hemû kêliyên şer û berxwedaniyê de digirtin û wiha domand: "Li hemberî van planên navnetewî û bi rakirina 72 balafiran li ser esîmanê Efrînê, berxwedaniyek û seferberiyeke efsanewî ji aliyê gel û parastvanên welêt ve hat raberkirin. Di nava vê berxwedaniyê de em jî weke rojnamevan û nûçegihan di hemû kêliyên şerî û berxwedaniyê de cih digirt. Li hemberî dijmin bi hevalên çeperan re, di nava mertalên zindî de, herwiha di nava gel de, li hemû gund, navçe û navendên bajêr de me cih girt û em bûn şahidê rastiya vî şerî û heqîqeta gelê ku ji bilî têkoşînê tiştek qebûl nedikir".

**`Rojnamevanên Efrînê bi îsrar bûn ku heqîqeta berxwedaniyê û rastiya dijmin derxînin holê`**

Zîlan bi van gotinan salvegera êrîşan bi bîr anî: "Bi rastî niha di van kêliyan de beriya 6 salan dîrokek ji berxwedaniyê, têkoşînê û êşê dihat nivîsandin. Dema ez niha van kêliyan tînim ser ziman em hîn jî wan rojan jiyan dikin û di bîra me de hîn zindîne. Tê bîra min rojekê em li gundê Ereba bûn, me xwest em hin çîrokên berxwedaniyê ji gel bigrin. Baregehên dagirkeriya Tirkiyê li gundê Xelîl bûn, mirov ne dikarî bi hesanî tevbigere, ji ber him balafir ser serê me digeriyan û him jî çete li hember me bûn, dîmenên êriş û pevçûnan di destê me de hene. ku çawa em aliyekî bi gel re hevpeyvîn çêdikin û li aliyê din jî topbaran dibare ser herêmê. Ev yek heqîqet bû rûxmî wan teknîkan rûxmî hovîtiya êrîşan, lê hevalên me yên nûçegihan, rojnamevan bi îsrar bûn ku gav paş de navêjin û ji raya giştî re vîn, berxwedanî, têkoşîn û rastiya dagirkeriyê derxînin hole. Dagirkeriya Tirkiyê gotibû ku wê di 2 rojan de Efrîn vala bike û têk bibe. Lê li hemberî hêzên cîhanê û raya giştî em wek hêza ragihandinê û çapemeniyê me ji cîhanê re îsbat kir ku va ye berxwedaniya serdemê bi lehengî û fedekartiya şervanên azadiyê 58 rojan li ber xwe da".

**`Belgekirina êrîşên dagirkeriyê û berxwedaniya gel kêlî bi kêlî dihate kirin`**

Herwiha Rojnamevan Egîd di axaftina xwe de diyar kir ku wan bi belgekirina kêliyên destpêkê yên êrîşan ji raya giştî re ragihandin ku dagirkeriyê bi armancgirtina sivîlan êrîşên xwe dest pê kir û wiha pê de çû: "Erkên me di şerê Efrînê de giran bû, rol û misyoneke giran li ser milê hemû hevalên ragihandinê hebû. Em jî yek ji wan hevalan bûn ku me cihê xwe di vê pêngavê de girt, ku em bikaribin bibin dengê van şervanan, dengê lehengên ku serkêşî ji şerê berxwedana serdemê re kirine. Dema êrîş destpêkirin ew bombebaranên ku li navçeyên Efrînê û derdora bajêr hatine kirin, weke kêliyên destpêkê hemû bi dîmen û wêneyan hatin belgekirin. Di wê demê de çapemeniya Tirkiyê dida nîşan dan ku ew baregeh û navendên leşkerî hedef girtine, lê belgeyên me îsbat kirin ku hemû xelkê Efrînê, deverên hemwelatiyên Efrînê û cihên xizmetê tên hedefgirtin û ev yek jî rojevên me yên sereke bûn. Ew êrîşên di saetên 04:10 deqe di 20'ê Çileya 2018 an li derdor Efrînê pêk hatine me ew jî belgekirin. Ew dîmen dide xuyakirin ku artêşa Tirkiyê gelê sivîl armanc kir".

**`Bi kêm derfetan destan xêzkirin`**

Egîd anî ziman ku ew bi kamîre û pênûsa xwe û bi derfetên herî biçûk dîroka berxwedaniya Efrînê xêzdikirin û wiha got:"Di wê demê de ewqas derfetên ragihandinê yên pêşketî di destê me de nîn bûn. Bi amûr û kamîreyên biçûk û kêm derfetan



Zîlan Hesen



Egîd Diyar

em tevlî vê berxwedaniyê bûn ku em bikaribin bibin perçeyek ji vê destanê. Bê guman zehmetiyên vî şerî û karê ragihandinê hebû, lê li hemberî berxwedana gelê me, berxwedana şervanên YPG-YPJ'ê me jî xwe deyndarê berxwedana wan didît. Li ser wî esasî tu astengî û sînor me li pêşiya xwe nekirin bend".

**`Amûrên peywendiyê hatin qut kirin`**

Egîd diyar kir ku ew di zanebûn û giraniya vî şerî de bûn, lewra xebatên parastina belgeyan hatin pêşxistin û wiha domand: "Em di zanebûn û berpirsyartiya şerê ku wê bê kirin de bûn. Di rojên destpêkê de weke qada ragihandinê me civînên xwe li dar xistin li ser esasê bi çi bedelî bibe em ê van kêliyan hemûyan belgebikin û ev belgên wê bên parastin. Di wê demê de ji ber giraniya wî şerî dorpêçek li ser herêmê di aliyê internêt û peywendiyê de hat çêkirin, ev yek jî bi destê dagirkeriya tirkiyê hat kirin. Ji bo ku rastiya vî şerî neyê ragihandin ji aliyê me de. Lê belê hemû hurguliyên wî şerî bi fedayetî hatin şopandin û belgekirin û ketin nava rûpelên dîrokê".

**`Di oxira vê berxwedaniyê de gelek can feda bû`**

Egîd di vegotina berxwedaniya Serdemê de anî ziman ku di oxira vî welatî de gelek hevalên rojnamevan birîndar û Şehîd ketin û wiha got: "Di berxwedana dîrokî ya Efrînê de êrîşeke bi hêsanî nebû, dagirkeriya Tirkiyê ji hemû aliyan ve 7 navçeyên Efrînê bi bejayî û hawayî bombabaran dikir. Tesbît û derxistina heqîqetê li ser milê hemû hevalên rojnamevanan bûn, her kêliyê her saetê me cihê xwe li gundekî û eniyekî şer digirt. Di oxira vî welatî de û bilindkirina dengê gel û şervanên azadiyê her wiha tesbîtkirina hovîtiya dagirkeriyê gelek hevalên rojnamevan birîndar bûn û gihîştin Şehadetê. Şehîd Tolhildan Welat yê YPG'ê di 22 Çilê de li girê Qstel Cindo Şehîdket, her wiha di Adarê de li gundê Kefir Sefrê Rêheval Rohende Denîz di encama êrîşên hawayî de Şehîd dikeve. Rastiya vê berxwedanê bi riya van hevalan hat derketin. Me soz dabû û em xwedî biryarbûn ku çi dibe bila bibe divê em vî şerî belge bikin. Ew yek jî keda wan hevalên ku Şehîd û birîndar bûne ye, ne ya me ye, tenê em beşek ji vê berxwedaniyê bûn".


**`58 rojên berxwedana serdemê ket nava rûpelên dîrokê`**

Rojnamevan Egîd Roj di dawiya axaftina xwe de bi bîr xist ku armanca me û ya hemû rêhevalên rojnamevan ew bû ku ev şer û berxwedanî bikeve nava rûpelên dîrokê û wiha got: "Em bûn şahidê gelek rastî, hurgulî, jiyana şervanekî, komkûjiyên pêk hatine, berxwedaniya hemdemî ya gelê Efrînê û rastiya dijminê sed salî. Armanca hemû hevalên Rojnamevan û ragihandina azad ew bû ku ew kêlî bên belegekirin û ji raya giştî û cîhanê re bibe bersîv. Bi ked û qehremantiya ku me aniye ziman ev armanc pêk hatin û 58 rojên berxwedana serdemê ket nava rûpelên dîrokê".

# 117 roj in ji rojnamevan Silêman Ehmed ti agahî nayê girtin

**Ji rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê ajansa Rojnews'ê Silêman Ehmed ku ji aliyê PDK'ê ve hatiye revandin, 117 rojin agahî nayê girtin. Li gel ku bertek û helwestên li dijî revandina Silêman Ehmed zêde dibin jî, lê PDK rê nade ne parêzer ne jî malbata wî hevdîtinê li gel bike.**

Rojnemevan Silêman Ehmed roja 1'ê Cotmehê ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Silêman roja 25'ê Cotmehê dema xwest di deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûr bibe, ji



aliyê hêzên PDK'ê ve hat revandin û 116 rojin agahî jê nayê girtin.
Hefteyek piştî windabûna Silêman Ehmed, asayîşa PDK'ê ya Dihokê di daxuyaniyek tejî berovajîkirin û nerast de got ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed 'ne ji ber karên wî yên rojnamevaniye' û bi eşkere gefa cezakirinê li rojnamevan Silêman kirin û îtiraf kirin ku wî revandine. Silêman Ehmed nêzî 5 salin di beşa Erebî ya ajansa me de wek edîtor dixebite.
Li gel ku bertek û helwestên dijî revandina Silêman Ehmed zêde dibin, her ku diçe guman û fikarên li ser jiyana Silêman Ehmed jî zêde dibin.
Lê hîna ji bilî daxuyaniyek tejî derew a PDK'ê, tiştek din ji aliyê hikûmeta Herêmê ve di derbarê rewşa Rojnamevan Silêman Ehmed de nehatiye ragihandin.
Herî dawî 2'yê Çile tîma parêzeran ji bo hevdîtina Silêman Ehmed serî li dadwer dan. Dadwer ferman da ku parêzer Silêman Ehmed bibînin. Lê piştî parêzer çûn asayîşa Dihokê carek din ji aliyê rêveberiya asayîşa PDK'ê ya Dihokê ve parêzer hatin astengkirin û guh nedan fermana dadwer.

# 25 Sal in Rêber Apo li dijî komplogeran têkoşînê dike

Ev 25 salin hêzên komploger bi armanca qirkirina gelê kurd û têkbirina Tevgera Azadiyê tecrîdeke giran li ser Rêber Abdullah Ocalan didin meşandin. Lê sekna Rêber Abdullah Ocalan û vîna gelên azadîxwaz armancên komployê pûç kirin.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Komploya Navnetewî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan dikeve sala xwe ya 26`an de. Hêzên komploger heta roja îro jî li ser karin û di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de qirkirina gelê Kurd tê meşandin. Li beramberî vê tecrîda giran a li ser Rêber Abdullah Ocalan û qirkirna ku tê meşandin, gelê Kurd û hemû dostên azadîxwaz li ser piyan e. Ji bona azadiya Rêber Abdullah Ocalan a fîzîkî û careserkirina pirsgirêka kurd di 10`ê Cotmeha 2023`an de kampaniyekî cîhanî hate destpêkirin û heta roja îro jî bi çoşeke mezin berdewame. Herwiha 2 meşên azadiyê, yek li Bakurê Kurdistanê ku di 1`ê Sibatê de hate destpêkirin, di heman demê de di 15`ê Sibatê wê li Amarayê kombûna herî mezin çêbibe. Li Ewropayê jî meşa azadiyê di 17`ê Sibatê de wê li bajarê Kulnê yê Elmaniyayê destpêbike. Herwiha wê di heman çarçoveyê de li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê, çalakiyên girêdayî salvegera 25mîn ya komployê berdewmbikn. Wekî din jî li zindanên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê, girevên birçîbûnê ji bona azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan werin meşandin.

**Komploya Navnetewî 25 salên xwe temam dike**

Komploya Navnetewî di 15`ê Sibatê de 25`salên xwe temam dike û dikeve sala 26`emîn. Ev komplo dema ku hat destpêkirin, armanca wê azadiya gelê Kurd û Tevgera Azadiyê, were rawistandin, lewra komploya navnetewî hat li darxistin. Komploya li ser Rêber Abdullah Ocalan hat meşandin, ne tenê bi destê dewleta Tirk bû û ew komployeke navnetewî bû. Ji bona Rojhilata Navîn a mezin alternatîfa Rêber Abdullah Ocalan hebû û ew xwedî pirojebû, ji ber wê yekê hêzên komploger ew kirin hedef.

**Berxwedan Rêber Apo ji bona Rojhilata Navîn dîrokî ye**

Berî 100`ê salan dewletên ku ji bo becewendiyên xwe dixebitin, Rojhilata navîn li gorî sîstema netew-dewlet xêzkirinbûn û ev 100 salin bi vî şêwazî berdewam dikin, lê sekna Rêber Apo ji bona Rojhilata Navîn, ya ku li hemberî sîstema netew-dewletê, sîstema netewademokratîk li pêş xist, ev jî ji bona gelên Rojhilata Navîn hêviyek bû, ji ber bi vê yekê wê gelên Rojhilata Navîn bi vîna xwe ya azad bijîn. Lewra dewletên hegemonîk ên ku di Rojhilata Navîn de, bercewendiyên xwe li pêş dixistin, di komploya navnetewî de bi rol bûn û dewleta Tirk jî kirin gardîyanê girtîgiha Îmraliyê.

**Armanca Komployê parastina hişmendiya netew-dewlet bû**

Di 9`ê Cotmeha 1999`an de dema ku Rêber Abdullah Ocalan ji şamê derket û çû Ewropa hemû dewletên Ewropayê, di serî de Rosiya û Amerîka pêşiya Rêber Apo girtin û ew radestî Tirkiyayê kirin. Dixwestin bi radestkirina Rêber Apo ji dewleta Tirk re Tevgera Azadiyê were lawazkirin û gelê Kurd were qirkirin. Lê berxwedan Rêber Abdullah Ocalan hişt ku gelê Kurd li derdora felsefeya Abdullah Ocalan kom bibe û hîn bi rengekî xurtir baweriya xwe pê bîne û armanca komployê vale derxîne. Armanca Komployê parastina hişmendiya netew dewletê ye û rê li pêşiya pirojeya netewa demukratîk ya Rêber Apo pêşxistiye.

Ev 25 salin ji bona azadiya Abdullah Ocalan, gelê berxwedêr di nava çalakiyan de ye, ev jî hişt ku dewletên destên wan di komployê de hebûn, bê encam bimînin. Niha zêdetir gelê kurd derdorê ramanên Rêber Apo, têkoşîn, rêxistinbûyin û pêşeroja xwe pilansaz kirin. Bi komploya navnetewî re, ne dewleta Tirk û ne jî dewletên navnetewî, gihiştin armanca xwe. Komplogeran ji bona Rojhilata Navîn, bercewendiyên xwe diparastin û xwestin Rojhilata Navîn her tim di nava xwînê de bimîn e, lê ev yek pêk nehat. Rêber Apo di gireva Îmaraliyê de jî, di şert û mercên tecrîdê yên giran de, pergal û felsefeya xwe li pêş xist û hêviyeke mezin ji gelên bindest re ava kir.

**Rêber Apo xeta mirovên azad di cîhanê de pêş xist**

Piştî hilweşandina komara Soviyêtê, cîhan ber bi yek alî ve çû, ew yek alî jî dixwest ku tu hêz li hemberî wî dernekeve û di xewn û xeyalên xwe de digotin; me hemû fikrên şoreşgerî di cîhanê de çewisandin e, tenê şoreşa azadiyê ya kurdistanê li ser piyane û ev şoreş bingeh û hêza xwe ji kê distîne. Ji ber di dîroka Kurdistanê de kesên ku şoreş li dar xistibûn, dihatin girtin û ji jiyana siyasî dihatin dûrxistin, lewra ew şoreş têk diçûn. Lê bingeha şoreşa Tevgera Azadiya Kurdistanê û hêza wê ji hizrên Rêber Abdullah Ocalan e. Ji bo wê Rêber Abdullah Ocalan ji milê komplogeran ve hate hedefgirtin, ji ber ku ew xwedî hizirekî azad bû û armanca wî avakirina civaka komînal û azad bû.

**Rola îxanetê di kornploya navnetewî de**

Di hundirê kurdistanê de, her tim modêla modernîta dewlet netew hatibû pêşxistin, li hemberî wê Rêber Apo xwedî hizireke konfedraliya demokratîk a Rojhilata Navîn bû, da ku wekhevî di nava gelan de bê avakirin. Ev jî nakeve xizmeta bercewendiyên dewletên desthiladar. Ji ber wê yekê hişmendiya nûjentiya kaptalîs li hemberî pirojeya nûjentiya demukrat pêşxistin. Planên hêzên hegemon Rojhilata Navîn a mezin avakirine, da ku careke din Rojhilata Navîn bixin nava şerekî 100`ê saliyê yê bêdawî û li Rojhilata Navîn li pêşiya belavbûna remanê Rêber Apo were girtin.

Ev 34 mehin ku Rêber Apo nekariye hevdîtinê bi parêzer û malbatê re çêbike. Rêber Apo ne tenê Rêberê Kurd tê naskirin, Rojhilata Navîn û cîhan tevhî jî Rêber Apo rêberê xwe dibînin û 15`ê Şibatê ji bo gelên azadîxwaz rojeke reş e.



**Heta azadiya Rêber Apo pêk were wê gel di nava tekoşînê de be**

Bi armanca azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, ji 10`ê Cotemeha 2023`an de hemleyeke cîhanî hat destpêkirin, ji beriya neha jî gelek hemle ji bona azadiya Rêber Apo hatine destpêkirin mîna ‘Dem Dema Azadiyê û ew jî li cîhanê tev belavbû û li gelek welatên cîhanê birêve çû. Niha jî ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û çareserkirina pirsgirêka Kurd, ji 10`ê Cotmehê ve li cîhanê tevahî hemle hatiye destpêkirin û li tevahî cîhanê çalakî di vê çarçoveyê de têne lidarxistin. Li zindanên Bakur û tirkiyê jî girtiyên azadiyê ketine nava gireva birçîbûnê de, berî vê girevê jî gelek girevên din ji bo Rêber Apo pêk hatibûn, girtiyên siyasî li hemberî tecrîdê bêdeng neman e. Îro di hemû girtîgihên Bakur û Tirkiyê de bi hezaran girtiyên azadiyê ji aliyê dewleta Tirk ve, tecrîd û işkence li ser wan tê meşandin.

**Rêber Apo riyên çareseriyê daniye holê**

Bi tecrîda li ser Rêber Apo, li hemberî gelê kurd dijminatiyekî mezin pêşdikeve. Li Tirkiyê îro kirîzên aborî, siyasî û civakî tên jiyankirin, sedema wê neçaresekirina pirsgirêka kurd e, neçareserkirina pirsgirêka kurd jî bi tecrîda li ser Rêber Apo ve girêdayî. Di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de, dewletên desthilatdar yên cîhanî di serî de dewleta Tirk, dixwaze qirkirina gelê kurd pêkbîne. Rêber Apo riyên çareseriyê daniye holê, lê hertim li pêşiya derfetên çareseriyê dewleta Tirk astengî avakirine û derfetên heyî ji holê rakirine. Li cîhanê şerekî li hemberî vîn û azadiya gelan tê jiyankirin. Demoqratîkirina Rojhilata Navîn, çareserkirinên civakî wê bi xwe re pêşbêxe. Ji bo wê dewleta Tirk amadeya bi her kesî re, bikeve nava danûstandina ji bo ku gelê Kurd qir bike.

**Pêwîste yekîtiya navnetewî were avakirin**

Sîstemên nijadperest temsîla gelan nake, riya çereseriyê li Îmraliyê ye, ew jî bi riya danûstandinê wê bê çareserkirin. Tu çareserî wê di Rojhilata Navîn de pêkneyê, heta ku Rêber Apo mîna muxateb neyê dîtin. Ji ber felsefeya Rêber Apo li ser bingeha vîna gelan hatiye avakirin. Gelê Kurd û dostên azadîxwaz bersiveke li gorî fikir û ramanê Rêbertî didine dewleta Tirk a qirker, faşîst û hemû hêzên komploger. Gelê berxwedêr di avakirina sîstema demokratîk de bi israr e, û pêwîste ku bi firik û felsefeya Rêber Apo yekîtiya navnetewî were avakirin.

# Siyaseta Dorpêçê ya hikumeta Şamê jiyana welatiyan dike xeteriyê

**Vîndar Roj/ Şehba**

**Dorpêça hikumeta Şamê ya li ser herêma Şehba û Taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yên Helebê bênavber dewam dike. Hevserokê Desteya Tendirustiyê yê kantona Efrîn û Şehbayê Azad Reşo diyar kir ku di encama dorpêçê de qada tendirustiyê di rewşeke xerab re derbas dibe.**

Herêma Şehba û taxên Eşrefiyê û Şêxmaqsudê zêdetirî 6 sala ye di nava siyaset û polîtîkeya dorpêça hikumeta Şamê ya bi armanc û mabestên siyasî tê pêkanîn re derbas dibin. Ev siyaseta ku dij pîvan û exlaqên mirovî ye, bandora xwe li hemû aliyên jiyanê kiriye. Piraniya welatiyên herêma Şehbayê koçberên Efrînî ne, hikumeta Şamê bi pêkanîna vê siyasetê jî dixwaze vîn û hêza avakirî ya li van herêman armanc dike û hewildide ku hebûna xwe careke din mayînde bike.



Dorpêça hikumeta Şamê di gelek aliyan de êş û zehmetiyên cidî di jiyana gel de daye avakirin. Bi taybet li ser qada tenduristiyê di aliyê kêmbûna deman, pêwîstiyên nexweşxaneyê, şîrê zarokan, herwiha nexweşiyên taybet ên demdirêj, bi giranî bandor kiriye. Têkildarî bandora dorpêça hikumeta Şamê li ser qada tenduristiyê. Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Kantona Efrîn û Şehbayê D. Azad Reşo ji rojnameya me re axivî.

**`Ji 6 salan ve polîtîkeya şikandina îradeyê tê meşandin`**

Azad di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser siyaseta dorpêça hikumeta Şamê û wiha got: “Hikumeta Şamê ji dema bicihbûna gelê Efrînê li herêmên Şehbayê siyaseteke qirêj li ser vî gelî dide meşandin. Ji 6 salan ve siyaseta dorpêçê bi giranî li ser gelê Efrînê yên li Şehba û Helebê bi bi cih bûne tê meşandin, ew jî bi armanca şikandina vîn û hêza ku hatiye avakirin e. Bi taybet hikumeta Şamê bi vê polîtîkeyê Rêveberiya Xwser armanc dike da ku ji nû de serweriya xwe li ser herêmê mayînde bike. Bê guman wê armanca hikumeta şamê bi meşandina vê siyasetê pêkneyê.

**`Dorpêça hikumeta Şamê tenduristî û jiyana gel dike nava xeteriyê`**

Azad anî ziman ku di encama dorpêçê de qada tenduristiyê di pirisgirêkên cidî re derbas dibe û wiha domand: “Bi gîştî ev siyaset bandora xwe li ser gelê Efrînê yê koçber bi giranî kiriye. Ev gelê ku ji 6 salan ve di şert û mercên zehmet re derbas dibe, lê bi hezkirineke mezin ji jiyanê re hemû pilanên dijmin têk dibin. Dorpêç di asta yekemîn de di aliyê kêmbûna sûtemeniyê de û nederbaskirina sotemeniyê dest pê dike. Hikumeta Şamê her demekî astengiyan li pêşiya derbasbûna sotemeniyê ji herêmê re çêdike û baceyên zêde distîne. Ev rewş bi taybet di demsala zivistanê de rê li ber êş û azarên zêde diveke û nexweşiyên cur be cur bi vê yekê re derdikevin holê. Bi taybet hikumeta Şamê bi pîvanên xwe yên dij mirovî qada tenduristiyê hedef digire. Di encama vê siyasetê de derman kêm derbasî herêmê dibe û piraniya dermanxaneyan kirîza kêmbûna dermanan jiyan dikin. Di gîştî herêma Şehbayê de tenê 2 nexwşxane hene û derman li wan kême û gelek caran peydanabe û raste rast bandora dorpêça hikumeta Şamê li ser vê yekê heye. Herwiha derfet nayê dayîn ku şîrê zarokan derbasê herêmê bibe. Ev yek yekser bandora xwe li ser rewşa gel bi gîştî dike û ger çareseriyeke bingehîn neyê peyda kirin, wê rewş pir xeternakbe”.

**`Divê Rêxistinên tenduristiyê yên cîhanî bibin hêza çareseriyê`**

Herwiha di dawiyê de D. Azad Reşo banga hemû rêxistin û aliyên têkildar ên navnetewî kir û wiha got: “Siyaseta dorpêçê û armanca wê bandoreke cidî li ser jiyana gel li herêmê dike. Di gîştî şer û qeyranan de korîdorên mirovî têne vekirin, lê hikumeta Şamê her tişt li gorî berjewendiyên xwe dike. Li ser vî esasî em banga tavahî rêxistinên tenduristî û mirovî yên navnetewî û cîhanî dikin ku bibin hêza çareseriyê li hember siyaseta dorpêça hikumeta Şamê li ser herêma Şehbayê”.



# ‘15’ê Sibatê ji bo gelê kurd rojeke reş e’

Komploya Navnetewî ya dijî Rêber Apo dikeve sala xwe ya 26’an. Girêdayî komployê endamê TEV-ÇAND’ê Xelîl Tehlo anî ser ziman ku roja 15`ê Şibatê ji bona gelê kurd rojekî reş e. Herwiha endama TEV-ÇAND’ê Şêrîn Mihemed da zanîn ku pêşxistin û parastina çandê li ser bingehê Netewa Demokratîk erkê tevahî civakê ye û bi taybet jî erkê jinê ye.

**Emîna Mihemed/Qamişlo**

Di sala 1999’an de, di encama Komployeke Navneteweyî de ku gelek hêzên navneteweyî tê de cih digirtin, Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan, hat revandin û radestî dewleta Tirk a faşîst hat kirin. Ji destpêka dîlgirtina Rêber Apo û heta niha tecrîdeke giran li ser tê feriz kirin. Ev bûye nêzî 3 salane tu agahî ji Rêber Apo nehatine girtin. Herwiha ji ber ku dîlgirtina Rêber Apo di 15`ê Sibata 1999`an de pêk hat, gelê kurd û şopdarên felsefeya Rêber Apo vê rojê bi rojeke reş bi bîr tînin.

Têkildarî komploya navnetewî ya li ser Rêber Apo endamên TEV-ÇAND’ê ji rojnameya me re axivîn.

**‘15`ê Sibata 1999’an ji bo gelê kurd rojeke reş bû’**

Xelîl Tehlo diyar kir ku wê çalakî ji bo azadiya Rêber Apo bidomin û wiha got: “Di 9’ê Cotmeha 1998`an de Komploya Navnetewî li ser Rêber Apo tê destpêkirin. Herwiha 15’ê Sibata 1999’an ji bo gelê kurd rojeke reş bû. Di vê rojê de gava komploya bêheqiyê li ser Rêber Apo hate destpêkirin. Di encamê de Rêber Apo bi komployeke navnetewî hat dîlgirtin. Ji wê demê ve em ji bo azadiya wî ya fîzîkî, têkoşînê dikin. Niha jî ji bo Rêber Apo bi rihê gelê şoreşgerî, azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û avakirina çanda Netewa Demokratîk çalakiyên xwe didomînin. Herwiha hemû armanc ji xebata me ew e, ku em piştgirtiya Rêber Apo bikin û bikaribin bi gavên mezin xwedî li Rêber Apo derkevin. Di heman demê de em bibin layiqê Rêber Apo, em çalakiyan her heyv, her roj ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, çêdikin.”

**‘Azadiya gel wê bi azadiya Rêber Apo pêk were’**

Xelîl Tehlo dazanîn ku komplogeran xwestin bi komploya li ser Rêber Apo îradeya gelê kurd bişkînin û wiha axivî: “Rêber Apo hêzê dide gelê kurd, azadiya gel bi destê Rêber Apo wê pêk were. Di heman demê de felsefeya Rêber Apo riya çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn e. Hêzên hegemon û serwerên cîhanê da ku îradeya gel bişkînin, lewra komployeke navnetewî li ser Rêber Apo dane meşandin û her tim xwestin di şexsê Rêber Apo de gelê Kurd qirbike. Lê tevî hemû hewildanan daxwazên komplogeran pêk nehat û niha jî ramanê Rêber Apo li nav gelên cîhanê belav bûye û bi felsefeya Rêbertî têkoşîn tê meşandin. ”



**Xelîl Tehlo**



**Şêrîn Mihemed**

**‘Divê Jin jî cihê xwe di nav xebatên çandî de bigre’**

Şêrîn Mihemed da xwiyakirin ku parastin û pêşxistina candî li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikeve ser milê civakê û bi taybet jinan û wiha got : “Îro jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe xebatekê didin meşandin û xwe di hemû waran de isbat kirine. Weke tê zanîn jî bi saya Rêber Apo jin xebatê dike û xwe bi rêxistin dike. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê em dibînin çawe ku jin di hemû warên jiyanê de cihê xwe bi rengekî aktîf digre, lê dijmin hewil dide vê yekê têk bibe û derfetê nade ku civak xwe bi rêxistin bike û bi vîna xwe û bi rengekî azad bijî. Dewleta Tirk a dagirker hertim êrişî mirovan û binesaziyê dike. Di heman demê de çanda hemû pêkhateyan jî dike hedef. Di roja îro de jî ji her kesî tê xwestin ku vê çandê biparêze û li pêş bixe, TEV-ÇAND jî di vî warî de berpirsiyar e. Ji bo parastina çanda hemû pêkhateyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya li ser bingehê Netewa Demokratîk kar û xebatê dide meşandin. Bi fikr û felsefeya Rêber Apo ya li ser bingehê Netewa Demokratîk, civak êdî çanda xwe diparêze û pêş dixe. ”

# Ji avabûna Îsraîlê ve têkiliyên wê li cem dagirkeriya Tirk

**Volqan Elî**

Di sala 1939’an de dewletên emperyalîst-kapîtalîst ên wekî Almanya, Îngîlîzîstan, Fransa û hwd. ji ber çavnebarî û daxwazên xwe yên mêtingeriyê tevî cîhan xistibûn nava agirê şer. Yek ji armanca wan a sereke ew bû ku Yekîtiya Sowyetê (Rûsya Sosyalîst) hilweşînin. Ya din jî xêr û bêra gelên cîhanê ji nû ve parve bikin. Ev şer pir dirêj kişand. Bi deh milyonan mirov jiyana xwe ji dest dan û zêdetirê wê jî birîndar bûn. Di dawiya dawî de DYE’yê balefireke tije ji bombeyên zerre (bombeya nuklêr) du bajarên Japonyayê yên bi navê Hîroşîma û Nagazakî bombebaran kir. Qaşo Japonya faşîst bû. Lê li Hîroşîma û Nagazakî gelê belengaz, hejar û kedkar helaq bû. Bandora vê çekê hê jî li van bajaran didome. Dewleta japonya ya niha jî tfaqeke herî bijarde ya pergala emperyalîst-kapîtalîst e.

Ji aliyê din ve faşîzma Hîtler jî li çend bajarên wekî Stalîngirad û Moskowayê bi hêza gel a Artêşa Sor hate şikênandin. Wekî ku şikestina li Kobanê ya DAIŞ’ê jê re bû destpêka dawiyê, şikestina ku faşîzma Hîtler ji Sowyeta Sosyalîst xwariye jê re bû destpêka dawiyê. Plana dewletên hakim ên cîhanê ew bû ku Hîtler sor bikin, kişî sosyalîzma Sowyetê bikin û wê di nava xwîn û agirê şer de bixeniqînin. Lê dema Hîtler ji kontrrola wan derket ji neçarî xwe avêtin ber bextê sosyalîzma heyî ya Sowyetê.



Di encamê de Almanya û Japonya teslîm bû. Sosyalîzma pêkhatî wekî dewlet hilnewaşiya, lê di rêya vegara xwe ya pergala kapîtalîst de bi lez bi pêş ket.

Yek ji encamên şer ên balkêş jî ew bû ku ji ber jenosîda li ser Yahûdiyan a faşîzma Hîtler Yahûdiyan bernameya xwe ya dîrokî bi alîkariya dewletên kapîtalîst xiste meriyetê: Li ser vê yekê, di dîroka 14’ê Gulana 1948’an de li ser erdên qedîm ên Kenan-Filîstînê dewleta herî dawî ya Yahûdiyan, Îsraîl hate avakirin. Ev dewlet li cîhanê hema di cih de wisa nehate naskirin. Lê Tirkiyeya dagirker, bû hêza sêyemîn a li cîhanê Îsraîl nas kiriye. Vê yekê, rewabûna Îsraîlê zêde kir.

Jixwe Yahûdiyên li cîhanê belav bibûn hê împaratoriya Osmanî li ser xwe bû, ji Abdulhamîdê padîşahê Osmaniyan xwestibûn bi navenda Îzmîr ji xwe re cihekî ava bikin. Wî qebûl nekiribû. Lê neviyên wî, berdevkên komara Tirk bi bezê bayê Îsraîla li ser erda Filîstînê bi coşeke mezin pêşwazî kiribûn.

Piştî vê pêvajoyê û bi dawîbûna şerê cîhanê yê duyemîn re derdorê 80’î sal derbas bûn. Bi sorkirina dagirkeriya Tirk, Hamasê li dijî Îsraîlê şerekî xwînavî da destpêkirin. Ji her du aliyan zêdetirî 30 hezar kesî jiyana xwe ji dest da.

Bazara Tirkiye, Hamas û Îsraîl bi temamî nayê zanîn. Herî dawî di dîroka 03.02.2024’an de berpirsiyarê MİT’a Tirk û zilamê yekemîn ê Hamasê Îsmaîl Haniye li paytexta Dohayê, li hev rûniştin.

Ji aliyê dîmenê ve dagirkeriya Tirk bûye parazvanê Erebên Filistînê. Lê hin daneyên aşkere bûnê rewşê berevajî nîşan didin:

Jixwe ji avabûna Îsraîlê ve têkiliyên dagirkeriya Tirk li cem wê ji stratejîkbûnê jî wêdetir in. Hin daneyên bi dest ketine pêşkêşî we bikin. Dema em wisa dibêjin ne ku me bi hunera xwe ev bi dest xistine. Di bîlançoyên wezareta karê derve û bazirganiyê yên dewleta Tirk de dîtina van gengaz e. Mînak dema Tayip ji bo Hamasê rondikên bi xwîn dirêjand, di meha 12’ê ya 2023’an de bazirganiya di navbera birayê wî Netenhahu de ji % 34,8 zêde bûye, bûye 430,6 milyon dolarî. Di vê gavê de (niha jî heman rewş didome) Tayip bi rondikên ji bo Ereban (!) rijandine, firşikê şovenîzma Tirk rakiriye û mûrîdên tarîqatan li Stenbolê hê jî alên bi erebî li ser nivîsandî ji destê xwe danayê xwarê.

Çapemenî û ragihandinên cur bi cur dem bi dem bi şaşitî yan jî bi zanebûn, ev nûçe dane pêş. Gava ku vê, rewşa heyî hinekê ronî kiriye, hikûmeta komara Tirkên dagirker qedexe li ser wan daniye.

Gelek daneyên bi vî şiklî hene, hemû dibe ku rûpelên pirtûkan dagire. Tenê em dixwazin yekê ji van parve bikin.

Bazirganiya di navbera dewleta faşîst a Tirk û Îsraîlê de bigir ji berhemên çîmento heya bi ava vexwarinê digire nava xwe (Tirkiyeyê çima Manavgatê firotiye Îsraîlê). Wekî me anî ziman yek ji van pir balkêş e. Bazirganiya pola û hesin… Ev berhema ku me aniye ziman ê dawî, salê li ser Îsraîlê bi 1,5 milyar dolarî dibe mal. Tê zanîn ku Îsraîl jî vî pola û hesinî zêdetirê wê di çêkirina çekan de bi kar tîne. Bi ihtimaleke mezin çekên ku niha li dijî gelê Filistîn tên bikaranîn, ji hesin û polayê Tirkiyeyê ye.

Ji Tayip re jî dimîne li ser xwîna gelê Filistînê li Dohayê bi Hamasê re bazariyê bike (li pişta perdeyê bazara wî bi Îsraîlê re ye)

## FENER



### Erdogan hewl dide Misrê li dijî vîna gelan biçewsîne

**Idrîs Henan**

12 sal navbera herdû serdanên Erdogan ji Misrê re hene. Di wê navberê de têkîliya herdû aliyan di zivrînokên hestiyar re derbas bûn û bi vekişandina karmendên balyozxaneyan û rawestandina têkiliyên diplomatîk re tacîdar dibe. Lê ya balkêş ew e ku têkîliyên aborî yên herdû dewletan bandor nebûn, berovajî, çendqatî bilind bûn û li gorî hinek daneyan; sala borî rêjeya 10 Milyar dolaran derbas kirin.

Bi destpêkirina raperînên gelan ên li dijî sîstemên destpot ên li Rojhilata Navîn, Erdogan piştgiriyek pir xort dide rêxistinên îslama radîkal. Li Misr, Tûnis û Lîbyayê Ixwan Elmislimîn, li Sûriyê û Îraqê jî DAIŞ û hemtayên wê yê Qayîde bûn. Erdogan dixwest bi desthilatkirina van koman re, sîstema xwe ya siyasî li herêmê ferz bike û civakê homohjen bike. Lew re têkiliyên stratejîk bi van koman re ava dike.

Çawa Mubarek li Misrê têk diçe, berê xwe dide wir. Heman salê, 2012 de, dema Ixwan li wir dibin iqtîdar, carek din berê xwe dide Misrê û piştgiriyeke bêsînor ji Ixwanan re radighîne. Ji xwe piştre jî, Mirsî diçe gel Erdogan li Enqerê, û destpêka sala 2013 an jî serokê Tirkiyê yê wê demê Gûl tê Misrê û daxuyaniya; “Di her warî de biryara avakirina hevpeymana stratejîk di navbera herdû welatan de” didin. Piştî demekê; wezîrê parastinê yê Misrê yê wê demê, Elsîsî serdana Tirkiyê dike û peymana hevkariya leşkerî ya bi 200 Milyon dolarî, ku balafirên bê mirov, keştiyên zirxî, wesayîtên veguhestina leşekrî û teknolojiyên din ên leşkerî vedihewîne, îmze dike. Lew re, wezîrê karê derve yê Tirkiyê Fîdan vê dawiyê digot ku ew ê balafirên bê mirov bidin Misrê.

Piştî hilweşîna iqtîdara Ixwan Elmislimîn 2013, Erdogan êrişên tund birin ser desthilatdariya li Misrê û weke “Derbeya li dijî serokekî hilbijatî” pênase kir. Aliyê xwe ve, Misrê jî Tirkiyê bi “fînansekirina terorê” tawanbar kir, ku Enqerê deriyên xwe ji rêveberên Ixwan Elmislimîn ên revyayî re vekirin. Piştî ku Sîsî jî dibe serokê Misrê, Erdogan tûj ser wî de diçe û dibêje ku ew qebûl nake pê re bi telîfonê jî biaxive!

Ev rewşa aloz navbera herdû dewletan de heya sala 2021 dewam dike, ku hinek daxuyaniyên Tirkiyê yên nerim derheqê Misrê de derdikevin. Lew re hinek hevdîtinên li ser astas saloxgeriyê dest pê dikin. Lê helwesta Misrê heya demekê jî tund dimîne ku ji Tirkiyê dixwest gotinên xwe li ser erdê pratîze bike. Bi destpêkirina Kûpya Cîhanê ya li Qatarê, Mijdara 2022, Elsîsî û Erdogan rastî hev tên û silava dest didin hev û din. Piştî wê jî Tirkiyê berê xwe dide alavên ragihandinê yên Ixwan Elmislimîn ên li dijî Misrê li Tirkiyê dixebitin û kapasîteya wan teng dike û gelekan jî derbeder dike.

Liv û tevgerînên xapînok ên Tirkiyê diyar dikin wê çendîn fêm kiriye ku bandora çeka Erdogan a Islama radîkal kêm bûye, ji ber wê jî polîtîkayên xwe di ber çavan re derbas dikin. Ew yek jî di çarçoveya şerê li herêmê berfiretir dibe û têkîliyên ji nû ve dîzayîn dibin de pêk tê. Herdû welat hewl didin bingeha avakirina sîstema têkiliyên li herêmê diyar bikin. Lew re jî Tirkiyê li Lîbyayê tawîzan dide û berî demekê ragihand ku amade ye li beşa rojhilat yê Lîbyayê konsolxaneya xwe veke. Aliyê din jî hewl dide Misrê, navbera xwe û Yonanîstanê de, bike navbênkar û di derbarê gaza Behra Spî û sînorên deryayî de hinek lehvehatinan bikin. Ya herî girîng jî ku Erdogan li pey wê ye, aliyê heremî de, di derbarê pêşeroja Lîbya û Sûriyê de, hemahengiyekê bi Misrê re ava bike û wê jî bixe xizmeta projeya xwe ya dagirkirina herêmê. Ji bona vê jî, carek din li pey lihvkirina bi sîstemên li herêm re ye ku li dijî vîna gelan a azadî û demokrasiyê bloka iqtîdarê ava bike û otorîteya xwe ya gihaye keviyê hilweşînê, li ser lingan bihêle.